



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 32**

# 4 - Babekê Xûramî - Ji sêwiyekî bû rêberê şoreşekê

*Babek* li Azerbeycanê sêwî û di rewşa xizaniyê da mezin bû. Ew di dema zarotiyê û beşek ji dema xortaniya xwe da dûrî dayîka xwe bû. Wek hemû zarokên gundan karên dijwar û giran dikirin. Hên di 10-saliya xwe da gavantî kir û di pey ra li ba hin derebegên Ereb û hinên erebkirî dixebitî; xizmet wan û sewalên wan dikir û li wir bi hin hevalên xwe yên din ra hînî lêdana tembûrê bû. Di temenê 18-saliyê da vegeriya ba dayîka xwe û di pey ra ket nav tevgera şoreşgerî ya *Xûramiye* ku bi rêberiya kesekî bû bi navê *Cawîdan*(1).

## Çawa Babek bû rêberê şoreşê?

Tevgera *Cawîdan* yek ji tevgerên *Xûramî* bû ku piştî kuştina *Ebo Muslimê Xurasanî* di sala 137-ê goçî (754-ê z.) li pey hev pêkdihatin. Hên di wê salê da tevgera *Sunbaz* pêkhat. Di pey ra tevgera *Ustadsis* di sala 149-ê goçî (766-ê z.) da pêkhat. Paşê tevgera *Yûsif Îbrahîm El-Berm* di sala 160-ê gêçî (776-ê z.) da pêkhat. Piştî wê tevgera *El-Muqen'h* di wê salê bi xwe da û di pey ra tevgera *Curcan* sala 162-ê goçî (778-ê z.) û piştî wê *Tevgera Azerbeycanê* sala 192-ê goçî (807-ê z.) qewimî. Pêkhatina van hemû tevgeran li pey hev nîşana wê yekê ye ku ayîna *Yezdanî* (*Ezdayî*) hên di bîreweriya cemawerên *Ariyanî* da zindî mabû û bi hêrzana (îlhama) wê ev şoreş li dijî dagîrkeriya *Erebî-Îslamî* pêkdihatin(2).

Gava *Babek* di 18-saliya xwe da bû, li herêma kurdî ya çiyayên *Baz* (*Bez*) li Azerbeycanê du tevgerên *Xûramî* yên dijberî hev hebûn. Ya yekem bi rêveberiya *Cawîdan* bû û ya duwem bi rêveberiya *Ebo Îmran* bû. Rêberê her tevgerekê têdikoşiya ku tevgera din têxe bin bandora xwe. Peyva "*Cawîdan*" di kurdî da tê maneya "*ezelî, sermed, nemird*". Li ser navê bavê *Cawîdan* di nav dîroknasan da cudahî heye. *Al-Teberî* û *Ibin El-Esîr* gotine "*Cawîdan Bin Sehl*". Lê *Ibin El-*

---

[1] Ibin Al-Nadim, Al-Fihrist, rûpel 416 - 417. Ibin Khurdazbeh, Al-Mesali we Al-Memalik, rûpel 119.
[2] Husain Qasim Al-Aziz, Al-Babkiye, rûpel 156 - 159.

*Nedîm* gotiye "*Cawîdan Bin Sohrik*"; yanê "sorik" biçûkkirina peyva "Sor". Herhal ev nav bi kurdî, yê rast û duriste[3].

Dîroknas *Ibin El-Nedîm* dinivîsîne ku *Cawîdan* çûye bajarê *Zencan* li bakur-rojavayê Îrana niha daku du hezar mîhên (merr) xwe bifiroşe û gava vegeriyaye çiyayên *Baz*, li *Rustaqa Meymed* berf (befir) bariyabû û dema êvarê bû. Ew çûye gundê *Bilal-Abaz* û xwastiye li mala serekê vî gundî bibe mêhvan. Lê belê serekê gund nexwastiye mêhvandariya wî û yên li gel wî bike û ew şandine mala dayîka *Babek* ku ew hêjayî vê mala xizan dîtine. Bi vî awayî *Cawîdan* û yên li gel wî bûne mêhvanên dayîka *Babek*. Dayîka *Babek* agirekî xurt ji wan ra dadaye û *Babek* xizmetkariya wan kiriye û sewalên wan bi cih kirine. Paşê *Cawîdan* wî dişîne ku xwarin û vexwarinê ji bo wan bikire û kah û ceh jî ji bo sewalan bîne. *Cawîdan* dibîne ku *Babek* xortekî aqilmend, çalak û mêhvanperwere. Ew radibe ji dayîka *Babek* ra dibêje ku pêwîstiya wî bi kurê wê heye daku ew karê rêvebirina gundên wî, mal û mewalên wî bi wî hilpesêre; û dibêje ku ewê her mehê 50 dirheman bide wî. Dayîka *Babek* razî dibe û wisa *Babek* dibe yek ji alîgirên *Cawîdan*[4].

*Ibin El-Nedîm* berdewam dike û dibêje ku *Ebi Îmran* êrişê tîne ser herêma *Cawîdan*. *Cawîdan* şerê wê dike, wî dikuje û bi xwe jî bi birîneka xedar birîndar dibe. Ew vedigere çiyayên xwe û hest pêdike ku temenê wî êdî temam bûye. Piştî sê rojan ew wexer dike (dimire). Jina *Cawîdan* hên gelek ciwan bû û bûbû evîndara *Babek*; ew û *Babek* wisa li hev tên ku êdî *Babek* bibe rêveberê alîgirên *Cawîdan*; ewê ji alîgiran ra van gotinan li ser navê *Cawîdan* bêje: "***Ezê îşev bimirim, giyanê min wê ji laşê min derkeve û têkeve laşê Babek û bi giyanê wî ra tevlihev bibe, ewê bigihîne astekê ku hên tikes negihîştiye wê û kesek piştî wî jî nagihiyê; ewê bibe serdarê zemînê, hêzdar û zordaran bikuje, Mezdekiyê vegerîne û bi wê, stûxwarên we, wê bibin payedar û yên xizan û perîşan wê bibin xwedî astên bilind***"[5].

Jina *Cawîdan* alîgirên wî vedixwîne civîneka giştî û vê daxwaza *Cawîdan* ji wan ra dibêje ku *Babek* piştî wî bibe rêveber; û dibêje "***kesê ku vê daxweazê nepejirîne bê ayîne***". Alîgirên *Cawîdan* tev razî dibin ku *Babek* bibe rêveberê wan. Jina *Cawîdan* ferman dide ku gayek bê serjêkirin. Ew ga tê gurandin û eyarê gayî tê raxistin. Ew teşteka tijî şerab datîne ser eyarê gayî, nan jî ker-ker dike û datîne dora teştê. Ji her kesekî ji alîgirên *Cawîdan* tê xwastin ku were ser eyarê gayî, pariyek (qetek) nan rahêje, têxe nava şerabê û bixwe; û bêje: "***Ey Babek! Min bi giyanê te bawer kir, wek ku min bi giyanê Cawîdan bawer kiribû***", di pey ra divêt destê *Babek* ramûse. Hemî wisa dikin. Di pey ra jina *Cawîdan* şahiyeka xwarin û vexwarinê li dardixe û *Babek* li ser textê xwe dide rûniştandin û li tenîşta wî rûdine. Gava ew vedixwin, gurzek reyhan radike û dide dest *Babek*. *Babek* gurzê reyhanan ji dest wê dibe û ev dibe hêma û nîşana mehirkirina wan[6].

---

[3] Al Tabari, Tarix Al Tabari, 8/56. Ibin Al-Asir, Al-Kamel fi Al-Tarix, 5/485. Ibin Al-Nadim, Al-Fihrist, 417.
[4] Ibin Al-Nadim, Al-Fihrist, 417.
[5] Ibin Al-Nadim, Al-Fihrist, 417.
[6] Ibin Al-Nadim, Al-Fihrist, 417 - 418.

## Rastî li kû ye?

Gava em bi awayekî mantiqî li van gotûbêjan temaşe bikin, wan ji raholkirin û guhartina bi mebest rizgar bikin, û ji nezaniya *Ibin El-Nedîm* derbarê ayîna *Yezdanî* paqij bikin, emê bigihînin vê encamê:

*Tevgera Cawîdan* tevgereka kurdî niştîmanî bû, armanca wê rizgarkirina gelên *Ariyanî* ji Îslametiyê û desthilata erebî û vejandina ayîna *Yezdanî* bû. *Cawîdan* û alîgirên wî xwe ji Îslametiyê paşva kişandibûn û vegeriyabûn ser ayîna *Yezdanî*. Ew bi armancên xwe her bawer bû û bi her awayî dixwast wan bi cih bîne. Ji ber wê, bi zanîn û baldarî, berî wexerkirina xwe *Babek* kiribû rêveberê şoreşê, ew bi hêz û şiyana wî ya rêveberiyê, bi aqilmendî, lehengî û bi dilsoziya wî ji armancên şoreşê ra bawer bû. Jina *Cawîdan* û mezinên rêveberiya şoreşê daxwaz û arezûya *Cawîdan* dizanîn û wisa *Babek* wek rêveber ji bo şoreşê hilbijartin.

Rawestandina *Ibin El-Nedîm* û yên din li ser wê yekê ku jina *Cawîdan* evîndara *Babek* bû û tevgera *Xûramî* xiste bin berjewendiya evîndariya xwe, sedem ewe ku ew derbarê rola jinan di civak û çanda Kurdan û ramanên ayîna *Yezdanî* da nezanin. Asta jinan di çanda kurdî da asteka berz û bilinde, jin herdem di standina biryarên şer û şoreşan da beşdar bûne. Jinên Kurd bi stran û helbest herdem evîna xwe derbirîne û dane xuyakirin (wek nimûne Edûl û Dewrêşê Evdî). Ev tişt di bermaya erebî ya kevin da tineye. Van dîrokzanên Îslaman azadiya jinan û nepenkirina rûyê wan wisa şîrove kirine ku ev yek bê exlaqî û tevliheviya jin û mêrane. Ew di bin bandora *Fiqha Îslamî* da ne ku dibêje: "*Jin ji serê wê ta bin pêyên wê şerm û eybe ku bê dîtin*", yanê xuyakirina her derekê ji laş û bedena wê heram û eybe[7].

Di van nûçeyên taybet da li ser şahiya hilbijartina *Babek* wek rêveberê şoreşê û birrîna mehra jina *Cawîdan* li wî, hin nîşanên bingeha *Yazdaniyê* têda hene. Yek ji wan, bawerî bi giyanekî gerdûnî razber û gelempere, giyanekî bê destpêk û bê dawî ye (Xweda) û bawerî ku hebûn di heft gerên gerdûnî ra derbas dibe û di her gereka gerdûnî da hinek ji vî giyanê gerdûnî dikeve laşê kesekî xwedî hêz û taybetmendiyên bê sînor, jêra bi lexem *Bab* yan *Baba* tê gotin. Ev kesê han, nawendeka gihîştinê di navbera giyanê gerdûnî û mirovan da ye. Li gor vê baweriyê, em dikarin lexema "*Babek*" şîrove bikin. Ev bawerî derbasî *Xirîstiyaniyê* jî bûye, ji baweriya ku pêximber *Îsa* ji giyanê Xweda peyda bûye. Ev bawerî derbasî *Şî'etiya Îranî* jî bûye ku bawer dikin *Îmamê bê guneh* di navbera Xweda û mirovan da ye.

*Xûramiyan* ji dema *Ebo Muslimê Xurasanî* da heyanî dema *Babek* bawer dikirin ku rêveberên wan giyanê gerdûnî dinimînin ku ew pîrozin û ji erkên wane ku li wan guhdar bikin û bi ya wan bikin. Heya niha jî, ev baweriya bi veguhastina giyan li ba beşên *Yezdaniyê* yên mezin (*Kakeyî, Elewî û Êzîdî*) hên jî heye. Nûçeya taybet bi serjêkirina gayî, nîşaneka rahole ji serjêkirina gayan di fêrewên ayînî yên

7 Burhan Al-Din Al-Bukhari, Al-Muhit Al-Burhani fi Al-Fiqih Al-Nu'mani, 1/483.

*Mîtraîzmê* da. Ev yek hên di şopa *Êzdîtiyê* da heye(8). Mesela vexwarina şerabê nîşana vexwarina *Homa* (*Haoma*) ye ku *Mogan* (oldarên Yezdanî) di fêrewên ayînî da bikar dihanîn(9).

Niha tenha ma ku em bêjin, çawa bûyerên *Şoreşa Babekê Xûramî* derbasbûn?

[8] Xalil Cindî: Êzdîtî û Ezmona dijwar, rûpel 38.
[9] Avesta, Yasna, rûpel 72, Ahmed Fakhri, Dirasat fi Tarix Al-Sharq-Al-Qadim, rêpel 231